

Azadîa rastî çi ye?

Sala 1906

Ji berî sed sala, welata Emrîke gelek feriq bî! Li sala 1906:

- Jina mafê dengdanê ne bî.
- Behira pitir miruv dimirin ji berî ‘emirê 50 sala.
- Dû ji deha mezin ne şîa binvîsit yan bixwînit.
- Bes şeş ji sedê Emrîkî ji xwandingeh amadeî şihade wer girtin.
- Bes 14 ji sedê xanî mezelka hemam yan banîo hebî. (Heker ne bî, teştaka mezin tijî av dikir u her miruv li malekê serê xu şîşt êk êk.)
- Behira pitir jinik bes êk carê heyvê pirrça xu şîşt. Zerika hêkê bi kar înan da bişut.
- Bes heşt ji sedê xanî telefon hebî.
- 8000 seyare hebîn. Behira pitir rêk ji axê u bera çêkirîn.
- Heqê şulê behira pitir miruva \$0.22 se’etê bî.
- Heqê şulê behira pitir miruva navbeyna \$200 – 400 salê bî.
- Heqê telefonê bu sê deqa ji Kaleradu heta Nîw York \$11 bî.
- Heqê erzaqa husa bî: pewndê şekirê \$0.04; duzde hêk \$0.14; pewndê qehweî \$0.15.
- Behira pitir jinik maîn li malê wextê biçîk bîn u ne çûne xestê.
- Not ji sedê dixtur ne çû bîn kûllîê. Çû bîn medresêt zanistî, belê hikmeta Emrîkê gut ew medrese ne gelek baş bîn.
- Behira pitir armancê mirnê ji kulatî singê yan sil yan zikê çûn yan dilê yan celta mejî bîn.
- 45 wîlayet yê Emrîke hebîn. (Nuke 50 hene.) ‘Elema Emrîke bes 45 stêr hebîn.
- Hejde ji sedê xanî êk yan pitir xulam yan xudam hebî. Emrîke jî welatekê muhacira u insanîa bî.

U ji ber hindê arîş (mişkîle) hebîn yê dînî u zimanê u sîasî.



Ted Rûsevelt
www.whitehouse.gov

Ted Rûsevelt (reîsê Emrîke yê jimara 26) gut, “Heker divîa ev welat xirab bin, dê hêlit ew bibit girêbîneka millet ku gel êk u dû şerrî bikin.” [Reader’s Digest, Oct.ober 2006, p. 106]

Li Emrîke guharrtin piç piç we lê dîkit. Belê li Kurdistanê guharrtin nuke gelek zî we lê dîkit.

Li sala 1906 Kurdistanê jî gelek feriq bî! Navbeyna Osmanî Tirkîe u Îranê bî. Bes 12,000 miruv jîan li Suleymanî. (Evro 800,000 miruv in!) Miruv wek Pîremêrd dest pê kir bi zimanê Kurdî binvîsit (bi Soranî). (Rojnama ‘ewilî hat destpêkirin li sala 1898.)

Pisîarê min bu we eve ne: Erê hîn çi dîkin kirîar da Kurdistan bibit cihekê azadî? Erê serbestîya dînî heye (ya rast u ne bes bi axiftinê)? Erê serbestîya axiftinê heye? Erê her hemî kes miruv êk rêz in? Erê jinik tînin rêza zelama da dengê xu bidin u da şul bikin u da şî ne kin heker ne vên u da seyare bihajon heker divên? Rastî?

Azadîa we heye. Bila bi kar bînin da welatê we cihek baş bit – bu hemîa – bu feqîra, zengîna, bîanîya, Kurda, ne Kurda, Izidîya, Biserrmana, Mesîhîya. Azadî tiştek hêja ye.